# TIRKÎYE | TURKEY

## USCIRF–RECOMMENDED FOR SPECIAL WATCH LIST

Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya DY (USCIRF) encûmeneke azad û cotpartîyî ya DY ye ku li derveyê welêt çavdêrîya serbestîya dînî û bawerîyê dike. USCIRF-a ku li ser hîmê Qanûnê Azadîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA) yê 1998ê avakirî ye, di seranserê dinyayê de ji bo çavdêrîya binpêkirinên azadîya dînî û bawerîyê de standardên Navneteweyî bi kar tîne û ji serekî, wezîrê karen derve û Kongresê re salixê şîretên siyasete pêşkêş dike. USCIRF, dezgeheke ji Wezîrîya Dewleta DY cuda ye û azad e. Raporta Salane ya 2021î encama xebatên yek salekê ya bibelgekirina ji alî Komîsyoneran û karkirên profesyonel ve binpêkirinên qadê û şîretên siyasetên ḥikûmeta DY nîşan dide. Raporta Salane ya 2021î heyama ji çileyê paşîn ê 2020î heta çileyê pêşîn ê 2020î digire nava xwe lê di hin rewşan de hin bûyerên giring ên berî yan piştî vê heyamê jî tên xuyandin. Ji bo zanyarîya bêtir a li ser USCIRF-ê, li vê sîteya înternetê binihêrin yan jî ji jimara têlefona 202-523-3240ê bi USCIRFê re yekser têkilî bikin.

### BIDESTKETÎYÊN HÎMÎ

Di 2020î de li Tirkîyeyê rewşa serbestîya dînî bi felekeke bifikar dewam kir. Di temûzê de Serekdewletê Tirk Receb Teyîb Erdoxan bi tevgereke ku gelek kes gotin ev tevgereke perçekir û kêmanîyên dînî yên Tirkîyeyê ji xwe re dike neyar, ji bo ku Ayasofyaya ku berê dêrek bûye û wek muzexaneyê xizmet dike bibe mizgeft, biryarnameyekê derxist. Hikûmet, ji bo Muzexaneya Qarîyeyê wek ji nû ve wek mizgeft bê vekirin gavên bi vî awayî avêtin, lê li gora hat danzanîn ev tevger hatin rawestandin. Hikûmet, ji bilî van, ji bo li ser çendîn mijarên serbestîya dînî bê rawestîn gelek kêm kefteleftê kir yan hîf nekir û di seranserê welêt de nehişt milkên kêmanîyên dînî bibin mebest û bên pelişandin. Digel daxwazên tekrarkirî yên ku komên kêmanîyên dînî ji bo weqfên nemislimanan bijartinên endamên encûmena birêvebirîyê pêk bînin, hikûmet, di seranserê salê de nehişt bijartin bên kirin. Herweha, hikûmetê guh neda gazîkirinên ji bo ji nû ve vekirina Xwandingeha Ruhbanên Rûmên Ortodoks ên Heybelîadayê û redkirina kesayetîya dezgehî ya hemû komên dînî dewam kir. Endamên partîya desthilatdar û nîvekarê koalîsyonê wek cîhê perestinê naskirina malên kombûna Elewîyan (cemevlerî) red kirin û hikûmetê red kir ew ji bo Elewîyan û komên din ên dînî kursên mecbûrî yên dînî û siyasetên din ên hînkarîyê û wek neqayîlbûna ji yên din re fikarên din ên serbestîya dînî biçare bike. Her çend destûrdar ji bo dan û sitandina bi hin serekên komên kêmanîyên dînî bizivîbin jî wisa xuya bû ku hikûmet piştî vê kombûnê ji bo qedandina fikarên van koman hîç tiştek nekiriye. Di çileyê pêşîn de parlamentoya Tirkîyeyê ji qanûnekî re erê kir û hatin hişyarkirin ku tevlî komên mafên mirovan û komên dînî jî, dê li ser civata sivîl peyderkirina jêderên li ser torê çavdêrîya hikûmetê bi çavdêrîyeke dijwar û sînorkirinan pêk bê.

Gelek ji kêmanîyên dînî, yan ji ber bûyerên ji alî aktorên derveyê dewletê re têkildar yan yekser ji ber pêkirina dewletê ya ser wan xwe hê jî di binê gefê de dîtin. Kom û dezgehên 'Elewî, Ermenî, û Protestanan dan zanîn gefên kuştinê li wan tên xwarin, herweha Cihû dan zanîn ku antîsemîtîzm bi piranî ji ber têkilîya bi şofa COVID-19ê re bêtir bûye. Suryanî, ji ber ku Sefer Bîleçenê keşeyê Ortdokos ê Suryanî (navê wî yê din Ahoyê Keşe) bi gunehbarîya ku wî ji endamên Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) re xwarin û avê peyder kiriye hatiye binçavkirin mehkemekirin û jin û mêreke pîr ê Kildanî eşkere hat revandin, -ku yek ji wan paşîyê mirî hatin dîtin, pir 'acis bûn. Hikûmeta Tirk, qaşo ji ber ku ew dibin sebebê "gefeke ewlehîya neteweyî", nehişt Protestanên biyanî bikevin welêt, hê jî ew dersînor kirin û asteng kirin. Di seranserê salê de destûrdar, kes û koman bi awayekî siyasî bi çêrkirinê gunehbar kirin, ji alîyekî ve jî yên di meqamên fermî de endamên komên kesên bêdîn û lezbîyen, gey, bîseksuel, transseksuel û înterseks (LGBTI) reş kirin û zimanê vegotina nefretê li dijî wan bi kar anîn.

-Tevlî cîhên perestinê û goristanan-, cîhên dînî, rastî zordestî, xerakirin û carcaran jî kavilkirina ku hikûmetê bi rêk û pêk wê asteng û ceza nake hatin. Di meha çileyê paşîn de kesên nenas li Stenbolê *cemevî*ya Pîr Sultan şikandin û li hundirî bi peyamên gefxwarinê dîmen bi dîwêr ve danîn. Di gulanê de kesek bi hinceta ku "koronavayrûsê anîye" xwast dêreke Ermenîyan bişewitîne û di heman mehê de kesekî din derîyê dêra Ermenîyan xêz kir û xacê şikand. Di rewşên din de, kesên nenas li Mêrdînê goristana Êzîdîyan xera kirin û li Trabzonê goristaneke Katolîkan hat xerakirin. Li Bûrsayê destûrdarên herêmî piştî sersarîya bi salan dewam kirî dêreke Ortodoksên Rûm pelişandin.

### JI HIKÛMETA D.Y. RE PÊŞNÎYARÎYIN

- Li gora Qanûnê Serbestîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA), Tirkîyeya ku tevlî binpêkirinên ciddî yên serbestîya dînî bûye û van binpêkirinan vedişêre tevlî Lîsteya Çavdêrîya Taybet a Wezîrîya Derveyê D.Y. bike;
- Ji bo ku Xwandingeha Rûhbanên Ortodoksên Rûm ên Heybelîadayê bê vekirin, ji bo bi temamî lihevhatina bi biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (ECtHR) yên li ser serbestîya dîn û bawerîyê, bi destûrdarên hikûmeta Tirk û çapemenîyê re di hemû kombûnan de di tenga herî bilind de pêkirina serê.

- Berê Sefareta D.Y. ya li Anqereyê û Konsolosxaneyên Stenbol û Edeneyê bidin ber bi vekirina cîhên din ên dînî yên xwedanê giringîya manewî, kulturî û kevnar û cîhên perestina komên dînî, ji nû ve qezenckirina wan, nûkirinê û çavdêrîya kefteleftên parastinê û hevkarîya bi hikûmeta Tirk re, ji bo teqezîya parastina sîteyên bi vî rengî; û
- Nirxandineke berfireh li ser alavên ku mîrasa dînî û kulturîya komên kêmanîyên dînî û nîjadî ne û vêga li ser axa Komara Tirkîyeyê ne, tevlî kêmkirina dualî ya anîna ji derveyê welêt xuyandî. Peymana milkîyeta kulturî ya di nava Dewletên Yekbûyî û Tirkîyeyê de destekê dide guherînên kulturî û hînkarîyê yên li ser destek û tarîxa van koman.

Kongresa D.Y. divê:

- Tevgera Tirkîyeyê ya li ser kêmanîyên dînî û teşqeleyên firehtir ên mafên mirovan, nirxandina D.Y.-Tirkîyeyê ya têkilîyên dualî dewam dikin, wek nimûne li gora Qanûnê Alîkarîya Dervceyî ya tarîxa 1961, S. Res. 755, madeyê 502B (c) zanyarîyê dixwaze.

### KILÎLA USCIRFê JÊDER Û BIZAV

- *Bûyer:* Danûsitandina bi USCIRFê re: Li Tirkîyeyê Serbestîya Dînî
- *Danxuyandina Çapemenîyê:* USCIRFê Biryar Da ku Rewşa Ayasofyayê bê Guherandîn
- *Op-Ed:* Serekên D.Y. Divên li dijî Zordestîyên Tirkîyeyê yên li Bakurê Sûrîyeyê Rawestin (di *Newsweek*ê de)
- *Beşa Raporta Salane ya li ser Sûrîyeyê:* ji bo zanyarîya li ser binpêkirinên serbestîyên dînî yên hêzên bi desteka Tirkan li Sûrîyeyê li cîhên dagîr kirine pêk tînin.

## Piştperde

Hikûmeta D.Y. texmîn dike ku nifûsa Tirkîyeyê hema hema 82,5 milyon e, ku ji sedî 99,8 Misliman in, an li gora texmînê ji sedî 77,5 a piranî bi Îslama Sinnî ve girêdayî ne. Di nava 10 milyon û 25 milyon kesan de kes xwe wek Elewî bi nav dikin, koma ku hikûmet bi piranî cudayîya wan a ji Mislimanên Sinnî qebûl nake. Ji sedî 0,2 ji xwedênenasan, Apostolîkên Ermenî, Bahaîyan, Bûlxarên Ortodoks, Katolîkên Kildanî, Ortodoksên Grek, Şahidên Yehovayî, Cihûyan, Protestanan, Katolîkên Roman, Ortodoksên Ûris, Katolîkên Suryanî, Ortodoksên Suryanî û komên din ên dînî pêk tên.

Qanûnê hîmî welêt wek dewleteke sekuler bi nav dike û serbestîya ijdanê, bawerîya dînî û qenaetê dabîn dike. Tevlî vê yekê, hikûmet, ji bilî van, bi navgînîya Serektîya Karûbarên Diyanetê (*Diyanet*) hem li ser Mislimanên piranî hem jî komên dînî yên ne misliman bi rêya Birêvebirîya Tevahî ya Weqfan (*Vakiflar Genel Mudurlugu*) çavdêrîyê li ser pêkanînên Îslamê dike û kontroleke berfireh pêk tîne.

Hikûmeta Tirk ji tevgera derba temûza 2016an ve bêtir binpêkir bû tevlî 292.000 kesên bi Fethullah Gulenê zilamê dînî yê navenda wî D.Y. ye girêdayî xuyandî, gelek rojnamegeran û yên wek dijberê siyasî têgihîştî, dijberên siyasî binçav kirin. Tirkîye ji bilî van di seranserê sala 2020î de ji sînorê xwe wê de çendîn tevgerên leşkerî pêk anî yan desteka xwe dewam kir. Di paşîya salê de gava Partîya Komunîst a Çînê bi Tirkîyeyê re peymana vegerandina dualî ya sûckirîyan îmze kir, komeke giring a dîyasporaya Ûygûrên Tirkîyeyê fikara xwe ya dersînorkirinê dewam kirin. Partî, çavdêrîya erêkirina peymana dualî ya vegerandina bi Tirkîyeyê re kir.

## Antîsemîtîzma Hikûmetê û Retorîka li dijî Kêmanîyan

Di seranserê salê de retorîka hikûmetê ya di tengên cuda de kêmanîyên dînî û kesên bêdîn bêtir kir mebest û ne bi tenê cudakarîyê li ser wan kir di heman demê de li dijî wan “zihnîyeta fethê” ya xetera teşwîqkirina sûcên nefretê tê de heye pêk anî.

Wek nimûne, di meha çîrîya paşîn de Serekê Diyanetê Alî Erbaş di merasimeke vekirina mizgeftekê de got “ên bi dinyaya wî alîyî bawer nînbin hîvîya her xerabîyê ji wan tê kirin” û kir ku Komeleya Ateîzmê ya Tirkîyeyê sûckirina wî ya “mebestkirina nebaweran” da zanîn. Erdoxanê Serekdewlet di axaftina xwe ya meha çileyê paşîn a yek ji bûyerên salê yên herî li dijî Cihûyan de êrîşî welatên Mislimanên wan bêtir in ên têkilîyên xwe û Îsraîlê asa kirine kir vê bi “yên li serê wan kîpa hebûn” pîroz kir.

Di temûzê de Erdoxanê Serekdewlet, piştî ku dadgehek statuya muzebûnê ya sîteyeke tarîxî rakir, piştî serbendên paşîn û gelek gefên li ser vê yekê, biryarnameyekê ji bo mizgeftkirina Ayasofyayê îmze kir. Di nimêja Înê ya pêşîn a di katedrala Kevn a Ortodoksên Rûm de Erbaşê Serekê Diyanetê ji ber peyama ku gelek kes wî ji ber tundkirîya li dijî kêmanîyên dînî yên Tirkîyeyê bi kar hatiye gunehbar kirin, şûrê xwe wek “nîşana fethê” li hewayê hişt.

## Gunehbarîyên Çêrkirinê yên bi Sebebê Siyasî

Desthilat, li gora Madeyê 216 (3) yê “eşkere çêrkirina nirxên dînî yên beşeke civatê” ceza dike gunehbarîyên xwe dewam kirin. Di nîsanê de destûrdar, ji ber ku wî di parvekirinên xwe yên çapemenîya civatî de ji bo rexnelêgirtina kempeyna komkirina bexyên COVID-19ê leyîstikeke peyvên dînî bi kar anîbû, Hakan

Aygunê edîtorê kevn binçav kirin; rûniştina wî ya dadgehî dê dewra paşîn a danzanînê de hê dewam dikir. Di hean mehê de Serdozgerîya Anqereyê, ji ber ku Baroya Anqereyê bilêvkirinên li dijî LGBTÎyan ên Serekê Diyanetê Erbaşî wek gotina nefretê bi nav kir, ji bo tolê lêpirsînek li ser wan da destpêkirin. Di gulanê de piştî ku li Îzmîrê hekir di minareyên mizgeftan de sitrana “Bella Ciao”yê lê xistibûn, destûrdarên herêmî, ji ber ku vîdyoya beşê di çapemenîya civatî de “bi pesnê” belav kirine û “nirxên dînî piçûk xistine” çendek kesan xistin bin çavî. Di nava binçavkirîyan de Banû Ozdemira siyasetmedara kevn a partîya dijber a li ser mijarê twîtê avêtibû jî hebû. Di nava salê de destûrdar, ji ber ku Enver Ayseverê rojnameger karîkatureke ku henekê xwe bi kesên dînî kiriye di înternetê de belav kiriye lê pirsîn û ew darizandin.

## KILÎLA SIYASETA D.Y.

Dewletên Yekbûyî û Tirkîye wek endamên Dezgeha Peymana Atlantîkê (NATO) hevkar in û li ser fikarên ewlehîyê yên navneteweyî hevkarîyê dikin. Lê digel vê hevkarîyê jî ji ber ku Tirkîyeyê sîstema fuzeyên S-400 a Rûsan kirî, digel fikarên D.Y. jî çendîn teşqele zirarê dan hevkarîyên dualî. Fikarên bi vî cûrî, berê Endamên Kongresê di çarçoveya Qanûnê Têkoşîna li Dijberîya bi Rêya Pêkandininên Neyarên Emerîkayê (CAATSA) de da erêkirina ji qanûnên pêkanîna pêdandikirinên li ser Tirkîyeyê û Dewletên Yekbûyî di meha çileyê pêşîn de li ser Serektîya Berhemanîna Parastinê ya Tirkîyeyê pêdankirinê pêk anî.

Hikûmeta D.Y. li Tirkîyeyê babetên serbestîya dînî bi rêk û pêk anî rojevê û car caran bi nûnerên kêmanîyên dînî yên Tirkîyeyê re da û sitand. Di temûzê de Michael R. Pompeoyê Wezîrê Derve yê yê wê dewrê li Tirkîyeyê israr kir ku Ayasofya wek muzexaneyekê bê parastin. Piştî biryara hikûmetê ya ku sîte bê kirin mizgeft, Alîkarê Serekî Michael R. Pence, ducarî gazîyekê kir ku ew divê ji gihana her kesî re vekirî be. Di çîrîya pêşîn de Serekê Nivîsîngeha Karên Ewropa û Avrasyayê Phillip T. Reekerê Sefîr hat Tirkîyeyê û bi Bartholomewê 1î yê Patrîkê Ekumenîk ê Konstantînopolîsê re ji bo dan û sitandina li ser serbestîya dînî hat serdana Tirkîyeyê û dîtina wî, ew çû geşta Mizgefta Rustem Paşayî û bi Serekpîskopos Paul Fitzpatrick Russellî, Nuncioyê Apostolîk re li ser li ser kefteleftên aştîyê yên bawerîyên li herêmê da û sitand. Piştî dewra raportkirinê, di çileyê pêşîn ê 2021î de Dewletên Yekbûyî û Tirkîye, ji bo astengkirina talankirin û revandina hebûnên kulturî peymaneke dualî ya kulturî îmze kirin.